

# Vegeriyana malê piştî lehiyê

Agahdarî li ser ka meriv çawa piştî lehiyê ewle bimîne

**Kurdish Kurmanji | Kurdî Kurmancî**

## OFFICIAL

Dema ku piştî lehiyê vedigerin mala xwe, vê zanyariyê bixwînin da ku xwe û malbata xwe ji birîndarbûn an nexweşiyêke ihtimalî biparêzin.

### Meriv çawa bi ewlehî vegere malê

- Tu carî di nav avên lehiyê de nemeşin, avjeniyê nekin, an jî neajon, her çend ew tenîsk be jî. Zarok û heywanên malê dûr bixin heta ku vegeriyana wan ewle be.
- Têkiliya çerm bi ava lehiyê û heriyê re dikare bibe sedema nexweşî û pêketinan. Ji têkiliya bi ava lehiyê dûr bin û destên xwe bi rêkûpêk bi sabûnê bişon.
- Dema paqijkirinê pêlavên dijî-av û lepikên naylonî yan çerm bi kar bînin.
- Her qutbûn an birînen ku dibe ku têkiliya wan bi ava lehiyê re hebe dapoşin. Eger hûn birîndar bibin an jî qutbûnek hebe, birîne paqij bikin û demildest bi bijîşkê xwe re têkilî dayînin.
- Berî ku hûn têkevin malê li van tiştan binêrin:
  - ✓ lehî dibe sedem ku ava gemar bikeve mala we
  - ✓ dibe ku dabînkirina gaz an ceryanê zîrarê dîtibe
  - ✓ dibe ku jêrsaziya mala we xera bûbe
  - ✓ dibe ku mar û heywanên din li mal, xanî yan baxçeyê we de xwe cih kiribin.
  - ✓ ava rawestayî ya ku di firaqên hewşa we de kom bûye bavêjin ji ber ku vizik tê de çêdibin
  - ✓ eger di mala we de kefik hebe, berî ku hûn vegerin malê divê wê paqij bikin.
- Eger we ceryan ji dest da bi, xwarin an dermanên di sarincokê de kontrol bikin. Dibe ku hewce be hûn wan biavêjin.
- Li hundirê jeneratoreke gûherr bi kar neyînin ji ber ku ew dikarin karbon monoksaydê çêbikin ku dikare we pir nexweş bixe.
- Lehî dikare ava we ya vexwarinê qirêj bike. Dezgeha xwe ya avê kontrol bikin ku ava lûleyê vexwarinê ewle ye. Eger hûn ne li ser ava sereke ne û fikir dikin ku ava we ya taybet ketiye bin bandora lehiyê, bi koneya xwe ya xwecihî re têkilî dayînin.
- Di rêyên avê, peravê, an hewzên avjeniyê de soberî nekin ji ber ku ew gemar dibin.
- Lehî dikare hin beşên xaniyê we yê wekî lûle, çîmentoyê an kaşiyên bihejîne. Eger hûn azbêstosê bibînin, madeyê tevlihev nekin û bi koneya xwe ya xwecihî re têkilî dayînin.
- Eger pergala we ya ava gemar ketiye bin bandorê, bikaranîna avê kêmbikin û bi lûlekêşekî re têkilî dayînin.

### Li xwe muqate bin

- Asayî ye ku hûn gelek hestan tecrube bikin, demekê diyar bikin li xwe muqate bin û ji bo piştigiriyê bigihîjin hezkiriyên xwe.
- Eger hûn xwe tijî xem hîs bikin, dikarin ji bo piştigiriyê belaş bi 1300 375 330 telefonî Navendên Tenduristiya Derûnî û Xweşiyê bikin.
- Eger hûn ji tenduristiya xwe bi fikar in, serî li bijîşkê xwe bidin. Di rewşa awarte de bo 000 telefon bikin. Eger hûn nikaribin telefon bikin, divê biçin nexweşxaneyê herî nêzîk.
- Eger hûn an kesekî ku hûn nas dikin di qeyranê de ye, bo Lifeline bi 13 11 14 an bo Beyond Blue bi 1300 224 636 telefon bikin.

## Piştewaniya aborî wergirin

- Eger mala we ketiye bin bandora lehiyê, dibe ku hûn ji bo bikarin diravê lezgîniya yekcarî wergirin. Ji bo zanyariyên pirtir biçin <https://emergencypayments.dffh.vic.gov.au>
- Eger hûn nikaribin li mala xwe bijîn ji ber ku ew xera bûye, an jî hûn ji 7 rojan zêdetir nikaribin bijîn mala xwe, Alîkariya ji nû ve Avakirinê dibe ku bo we jî hebe. Ji bo zanyariyên pirtir, biçin <https://services.dffh.vic.gov.au/personal-hardship-assistance-program>
- Yarmetiya Başbûna ji Karesatê bo karmend û bazirganên yekane yên ku ji ber karesateke mezin dahata xwe ji dest didin heye. Hûn dikarin heya 13 hefteyan piştî ku karesat çêbibin, drav bistînin. Ji bo zanyariyên pirtir biçin <https://www.servicesaustralia.gov.au/natural-disaster-events?context=60042>
- Eger we birîneke giran hebe yan jî mala we ji ber lehiyan zirareke mezin dîtibe dibe ku hûn bikarin Diravê Başbûna ji Karesatê ya Hikûmeta Avûstralyayê wergirin. Mezin dikarin \$1,000 û zarok dikarin \$400 wergirin. Ji bo zanyariyên pirtir biçin <https://www.servicesaustralia.gov.au/victorian-floods-october-2022-australian-government-disaster-recovery-payment>.
- Ji bo arîkariya bo rûniştina demkî û piştgiriya din bi 1800 560 760 ji Xeta sor a Başbûna ji Lehiyê re telefonê bikin.
- Eger bo mijarên sîgorteyê pêdiviya we bi arîkariyê hebe, bi 1800 734 621 li ser xeta sor a karesatê ya Avûsturalyayê ya Konseya Sîgorteyê telefon bikin.

Bo wergirtina vê belavokê bi formatê guncaw, emailê bişînin [pph.communications@health.vic.gov.au](mailto:pph.communications@health.vic.gov.au)

